# Mafên te dema ku tu li rêveberîya polîsan bî

RÊBERNAMEYEKE JI BO ZAROKAN Û CIWANAN

**Di vê belavokê de derbarê mafên te yên dema hebûna te ya li rêveberîya polîsan agahiyên giring hene.** Maf azadî û piştgiriyên me hemûyan in ku bi qanûnan tên parastin. Mafên zarokên ji 18 salî biçûktir ji yên mezinan hinekî cudatir in, û di vê belavokê de mafên te tên şirovekirin.

**Heke mafên xwe bizanî, tu yê fêm bikî ka kengê bi te re muameleya dadmendane hatiye kirin.** Heke delîl hebin ku te tiştekî zirardayînê kiriye jî, ji peywirên polîsan e ku dema tu li rêveberîya polîsan bî te ji ziraran biparêzin û hay ji tenduristiya te hebin.


**Tika ye heta ji te tê di wextekî zûtir de vê belavokê bixwîne.** Dema ku tu li rêveberîya polîsan bî ev ê ji bo biryarên te bibe alîkar. Kesê vê belavokê dide te dê pêşniyaz bike ku ji bo xwendin û fêmkirina vê ji te re bibe alîkar. Ew ê her wisa bipirsin ka tu vê belavokê bi zimanekî din yan jî bi versiyoneke xwendina wê hêsantir dixwazî yan na.

CYCJ Children and Young People's Centre for Justice
STARR
Safer Scotland Scottish Government

1. **Mafê te heye ku tu bizanî ka polîs çima te li rêveberîya polîsan radigirin.**

2. **Mafê te heye ku tu bizanî ka polîsan çima tu anîyî rêveberîya polîsan.**






3. Divê tu navê xwe, navnîşana xwe, roja jidayîkbûna xwe û dewleta tu welatiyê wê yî -heke bizanî- ji polîsan re bibêjî. Pirsên mecbûrî tenê ev in. **Mafê te heye ku tu bersiv nedî pirsên din.**

4. **Mafê te heye ku tu hin kesan derbarê girtina xwe de agahdar bikî.** Polîs dê ji te bipirsin ka tu dixwazî hin kes derbarê girtina xwe de agahdar bikî. Ev dikare kesek ji malbata te, hevjîna/ê te, xwedîkara/ê te, hevaleke/î te yan jî kesekî/e din be. Dibe ku destûrê nedin ku tu bi vî kesî/ vê kesê re biaxivî. Heke tu 16 salî bî yan di bin fermaneke çavdêriyê ya demkî de bî, mafê te heye ku li rêveberîya polîsan hin kes li ba te bin. Mafê te heye ku dê û bavê te yan jî weliyê te li rêveberîya polîsan serdana te bikin.

5. **Mafê te heye ku ji parêzerekî re bibêjî tu li rêveberîya polîsan têyî ragirtin.** Polîs dê ji te bipirsin ka tu dixwazî ew parêzerekî derbarê girtina te de agahdar bikin. Ev dibe ku parêzerê te bixwe be "Parêzerê nobedar" yan jî ji bo te dê parêzerek bê peydakirin. Ev belaş e.



6. **Her gav mafê te heye ku tu bi awayekî taybet bi parêzerekî re biaxivî.** Ev belaş e.

7. **Mafê te heye di dema hevdîtina bi polîsan re parêzerek li ba te hebe.** Ev belaş e.

8. **Heke tu ji 16 salî biçûktir bî, bi şertê kesî nexe nav rîskê, pêwist e di dema hevdîtina polîsan de parêzerek li ba te be.** Heke tu 16 yan 17 salî û di bin fermaneke çavdêriyê de bî, ji bilî rewşên îstisna, pêwist e di dema hevdîtina bi polîsan re parêzerek li ba te hebe.

9. **Heke tu nexweş yan jî birîndar bî mafê te yê wergirtina alîkariya tibî heye. Tenduristiya derûnî jî di nav vê de ye.** Polîs dê derbarê tenduristiya te û başiya te de ji te pirsan bikin ku piştrast bibin di dema te ya li rêveberîya polîsan de hay ji te mane. Heke rewşeke te ya tibî hebe ku di dema te ya binçavkirinê de bandorê li te bike, giring e ku tu vê yekê ji polîsan re bibêjî. Dibe ku polîs gazî doktor yan jî hemşîreyekê bikin ku te kontrol bike. Ev ji bo hindê ye ku piştrast bibin di dema te ya li rêveberîya polîsan de hay ji te mane. Polîs dê ji te bipirsin ka pêwistiya te bi hindê heye ku bi doktor, hemşîre yan jî pisporekî tenduristiyê re biaxivî.

10. **Mafê te yê ji bo êxwarin û vexwarinê heye.** Av dê ji bo te bê dabînkirin. Heke tu ji çar saetan zêdetir li rêveberîya polîsan bihêyî ragirtin dê xwarin ji te re bê anîn. Di demeke zûtir de polîs dê ji te bipirsin ka tu kîjan xwarinan naxwî.

CYCJ Children and Young People's Centre for Justice

STARR

Safer Scotland Scottish Government

# Rêbertiyeke zêdetir...

**Heke ji te re alîkariyeke zêdetir divê**
Dibe ku ji te re alîkarî bivê ku tu fêm bikî ka dema ku tu li rêveberîya polîsan î çi diqewime. Heke tu 16 salî yan jî mezintir î, ev alîkarî dibe ku ji kesên piştgirê yên perwerdekirî be ku ji wan re "Salmezinê Maqûl" tê gotin. Heke astengiya te ya têgihîştinê yan jî problemên te yên tenduristiya derûnî hebin dibe ku ev yek ji te re pêwist be. Heke polîs bifikirin ku ji te re alîkariya "Salmezinekî maqûl" divê, heke tu nepirsî jî ew ê yekî ji te re bînin.

**Ji bo alîkariya te anîna wergêrekî devkî**
Giring e ku tu fêm bikî ka li rêveberîya polîsan çi tê gotin. Heke tu nikarî bi înglîzî biaxivî yan jî fêm nakî, polîs dê ji bo alîkariya te yekî bi zimanê te diaxive bîne. Ji van re dibêjin wergêrê devkî anku "interpreter". Ev belaş e.

**Alîkariya di peywendiyê de**
Ji bo gelek kesan zehmet e fêm bikin ka li rêveberîya polîsan çi diqewime. Divê polîs bipirsin ka ji te re alîkarî divê yan jî ka tu derbarê hin tiştan de ne zelal û piştrast î. Heke pêwistî hebe divê alîkariya ji bo xwendinê peyda bikin. Heke guhên te kerr bin yan jî di peywendiyê de zehmetiyên te hebin polîs dê ji te re alîkarî peyda bikin. Dibe ku ev tercumanekî BSL'ê yan jî pisporekî din ê guncav be. Ev belaş e.

**Heke tu ne brîtanî yî**
Heke tu ne welatiyê Brîtanyayê bî, divê polîs pêşniyaz bike ku ji Komîseriya Bilind, Balyozxane yan Konsulxaneya welatê te re bibêje ka tu çima li rêveberîya polîsan î. Paşê kesek dikare bi taybetî were serdana te û ji bo dîtina te parêzerekî peyda bike.

**Heke tu li ser biryara mehkemeyê bihêyî sûcdarkirin û te bînin rêveberîya polîsan dê çi bibe?**
Heke tu ji ber sûcekê têyî sûcdarkirin, dibe ku destûrê bidin ji bo çûyîna te yan jî li hucreya polîsan bihêyî ragirtin û roja paştir ya guncav te bibin mehkemeyê. Heke tu li ser fermaneke girtinê anîbin rêveberîya polîsan, dibe ku tu li hucreya polîsan bihêyî ragirtin û roja paştir ya guncav te bibin mehkemeyê. Di hin rewşan de dibe ku destûrê bidin te ku tu herî malê.

**Dikarin çiqasî te li rêveberîya polîsan ragirin?**
Polîs dikarin bêyî sûcdarkirinekê te heta 12 saetan ragirin. Polîs dikarin vê herî zêde derxin 24 saetan, lê tenê heke polîsekî payebilind ê xwedan tecrûbe vê qebûl bike. Mafê te heye ku tu derbarê vê biryarê de gotina xwe bibêjî yan jî tu bixwazî ji dêvla te ve parêzerê te bi polîsan re biaxive.

**Dîtina belgeyan**
Heke doza te biçe mehkemeyê, ew ê noteke delîlên dozê bidin te yan jî bidin parêzerê te. Ev ê ji bo parastinê alîkariya te û parêzerê te bike. Heke tu înglîzî fêm nakî mafê te heye ku wergera van agahiyan, yan jî herî kêm wergera beşên têkildar yên belgeyên giring bidin te.

CYCJ Children and Young People's Centre for Justice
STARR
Safer Scotland Scottish Government

# Rêbertiyeke zêdetir...

**Agahiya derbarê mafê xwegihandina parêzeran de**

- Polîs dê ji te bipirsin ka tu dixwazî bi parêzerekî re biaxivî. Polîs dê di demeke zûtir de ji bo te bi parêzerekî re peywendî bigirin.
- Mafê te heye ku tu çi dema bixwazî bi parêzer re axaftineke taybet bikî. Ev dibe ku li ser telefonê be yan jî li rêveberîya polîsan bi awayê rû bi rû be.
- Axaftina bi parêzer re tiştekî asayî ye û nayê wateya tiştekî xirab.
- Karê parêzeran ev e ku mafên te biparêzin û derbarê qanûnan de şîretan li te bikin.
- Tu dikarî bixwazî bi parêzerekî tu nas dikî re yan jî bi parêzerekî ku polîsan ji bo te peyda kiriye re biaxivî – ji vî parêzerî re dibêjin "Parêzerê nobedar.". "Parêzerên nobedar" serbixwe ne û ne ji polîsan re dixebitin.
- Heke polîs bi te re hevdîtin bikin, ew ê ji te bipirsin ka tu dixwazî di wê demê de parêzerek di hundir de be yan na.
- Di rewşên asayî de heke te daxwaza parêzerekî kiribe mafê polîsan tune ye ku bêyî parêzer bi te re hevdîtin pêk bînin.
- Dema tu bixwazî tu dikarî biryara xwe ya derbarê hebûn an nebûna parêzer de biguherînî. Di demeke zûtir de polîsan agahdar bike ku ji bo te bi parêzerekî re peywendî daynin.
- Heke parêzer di dema gotî de yan jî di dema ji te re pêwist de nehatibe rêveberîya polîsan, tu dikarî ji polîsan bixwazî ku dîsa û dîsa pê re êpeywendî daynin. Piştî ku polîsan bi parêzer re peywendî danî, mafê polîsan nîn e ku li ser dema hatina parêzer biaxivin. Heke tu bixwazî polîs dikarin raman û daxwazên te bi wî parêzerî re parve bikin.

**Mafê te yê gilîkirinê**

- Mafê te ye ku tu derbarê muameleya li te hatî kirin de gilî bikî.
- Heke tu giliyê Polîsê Îskoçyayê (Scotland) bikî ev ê zirarê nede doza te.
- Tu dikarî dema binçavkirinê giliyê wan bikî.
- Heke tu bixwazî dema binçavkirinê giliyê wan bikî, bixwaze bi êpirsekî re yan jî bi yekî payebilindtir re biaxive.
- Heke tu dixwazî piştî berdana xwe gilî bikî, tu dikarî herî rêveberiyeke polîsan.
- Heke tu di dema girtinê de yan jî di binçavan de ji aliyê polîsekî ve hatibî êşandin yan jî te zirar dîtibe pêwîst e tu giliyê xwe li ba "Dezgeha Standardên Pîşeyî ya Îskoçyayê" bikî.
- Ji bo gilîkirinê telefonî hejmara "101" bike yan jî here rêveberîy polîsan a herêma xwe.
- Tu dikarî her wisa ji hin kesên din bixwazî ku li ser navê te gilî bikin. Ev dikare hevjîn, hevalek yan jî kesekî din be ku baweriya te pê heye. Pêwîst e tu destûra nivîskî bidiyê.

Ev belavok bi awayekî hevpar ji hêla endamên STARR'ê ve ku yekane qad e li Skotlandê ji bo kesên xwedî ezmûna lênihêrîna ewledar, bi hevkariya "Navenda Zarok û Ciwanan a Dadmendiyê" (CYCJ) û Hikûmeta Skotlandê ve hatiye çêkirin. 'Mafê te yê gilîkirinê' ji "People First Scotland" hatiye adaptekirin.

Ji bo agahiyên zêdetir here malpera **justtherightspace.org**

© Crown copyright 2023

Children and Young People's Centre for Justice

Safer Scotland
Scottish Government